rupel 1++_Layout 1 12.08.2022 18:29 Page 1



## Nameya bixêrhatinê

Mîzgîn Ronak ji niha û şûn de li ser xaka pîroz ji Şîrîn re lêv, ji Ferzad re dest û ji zarokên Kurdistanê re dil be. Nexwe Ferzad gotibû: "Çi zimanî diaxive bila biaxive, bihêlin bila dilê min di singa zarokekî de lê bide." ... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Şîret û rexneyên weşanxaneyan

Gelek nivîskar û weşangerên kurd ên şîretkar, gazindok û rexnegir, bixwe li dibistanên dewletê mamostetiya tirkî dikin. Danê sibehan diçin dibistanan zarokên kurdan asîmîle dikin û danê êvaran jî tên weşanxane, buro û malên xwe... ***Amed Tigrîs / R.5***



## Sînorên başî û xerabiyê

Hemû pêvajoyên neyînî yên ku li derdorê diqewimin encama ramanên di hişê me de ne ku mixabin bi tevahî bi nefs û hestên xwe yên neyînî ve girêdayî ne. Têkiliya mirov bi xirabiyê tê girêdandin û ji ber vê yekê... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.7***


# xwebûn

15 - 21 TEBAX 2022 HEJMAR: 139 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org



# Ji vejînê ber bi azadiyê ve

## Komek şervanên azadiyê di 15'ê Tebexa 1984'an de ji bo nîrê koletiyê yê bi hezaran salan bişkîne li Dihê û Şemzînanê guleya yekem di mejiyê dagirkeriyê de teqandin. Guleya 39 sal berê hat teqandin îro ji bo hemû gelan bûye hêviya azadî û serfiraziyê

Felsefeya, "Berxwedan Jiyan e" ya 14'ê Tîrmehê bi 15'ê Tebaxê vegeriya destana jiyanek nû û tolgirtina hezar salan. Fermandarê mezin û nemir Egîd bû sembola nifşek bêtirs, xwedî hezkirin, wêrek, fedakar û fedayî. Dagirker ev pêncî sal in hewl dide qereqolên tirs û xofê li ser piyan bigirin lê her roj dîwareke wan tê hilweşandin. Egîd û Zîlanên Kurdistanê li çar aliyên welat doza azadkirin û parastina axa pîroz dimeşînin. Tirsa di dilê dagirkeran de her kêliyê mezin dikin... ***H. Halit Alaçati / R.8***

Ruhê ku bi 15'ê Tebaxê re pêş ket, serê kurdan ji bin nîrê koletiyê rizgar kir; hişt ku kurd li hember pergala koledariyê ya hezar salan serî rakin û serfiraz bijîn. Sond û peyman a ligel girêdana dayikniştiman a xakê vejand. Ligel têkoşînê, di heman wextê de ponijandina mezinkirina xeyalên azadiyê bi pêş ve bir. Pirsa ma gelo, 'ez kî me û dikarim ji bo xwe çi bikim' bi pêş ket. Biryara avêtina fîşeka êvara 15'ê Tebaxê ya sala 1984'an ji tunebûnê hebûn, ji bêderfetiyê derfet afirand... ***Adar Gulan / R.2***

Heke paradîgmaya Rayver Apo û PKKyî nêbîyayêne belkî ewro dewletê bi nameyê Sûrîye û Îraqî çin bîyayêne. PKKyî DAIŞ o ke mîyanê didi aşman de artêşê Îraqî û Sûrîye têk berdî û xîlafetê çeteyan îlan kerd, têk berd. Bi des hezaran çeteyê DAIŞyî ewro di destê HSDyî de yê. PKKyî bi nê têkoşînê xo vernîya ro naye girowte û ewro bi nê hêzan reyde şirîkatîya eskerî keno. Seba ke no hêz wayîrê îradeyê polayî yo, qasê ke nerm bikerê û bi goreyê menfîetanê xo bi kar bîyarê, di mîyanê plan û projeyan de yê... ***Xoser Welat / R.9***



## HDP pira yekitiya gelan e

Endama Lijneya Rêvebirina Navendî ya HDP'ê Ozlem Gunduz têkildarî tifaqa demokrasiyê nêrînên xwe anî ziman. Gunduz diyar kir ku HDP di her şert û mercî de ji bo ku tifaqa demokrasiyê berfireh bibe bernameya xwe pêk tîne û wiha got: "HDP di nava gelên Tirkiyeyê de pira yekitiyê ye. Di heman demê de di siyaseta Tirkiyeyê de jî hêza diyarker e. Ji ber vê yekê desthilatî di nava xofê de ye. Di vê pêvajoyê de HDP'ê li dijî êrîşan ne tenê xwe li ser piyan girt, pêşengtiya mûxalefeta civakî jî kir û ji gelek aliyan ve bi desthilatê jî da windakirin. Gelek beşên civakî çareseriyê di HDP'ê de dibînin."... ***R.6***



## Azadiya piştî 30 salan

Nivîskar Mizgîn Ronak di 19 saliya xwe de (1992) li Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê (DGM) ya Amedê hatibû dadgehkirin û bi îdiaya 'endamtiya rêxistinê' 30 sal ceza lê hatibû birîn. Ronak 30 sal şûnde tehliye bû û di axaftina xwe ya li ber girtîgehê got 'Heta hemû hevalên me azad ne bin, azadî nîvco ye'... ***R.11***

## Qeyûmî milkê şarî roşenê terefgiran

Dewleta tirke vera kurdan çi ke dest ra yeno kena. Hetêk ra muwazeneyê ekolojîkî yê Kurdistanî xeripnena, hetêkê bînî ra ziwanê kurdî ser o teda kena. Eynî wextî de konseranê hunermendan qedexe kena. Xerza nê kerdişan pê qeyûman muşterekanê şarê kurdî tirawena. Bitaybetî aşmanê peyênan de bajaranê Bakurê Kurdistanî de derheqê rotişê milkanê şaredarîyan de xeylêk xeberî yenê kerdene. Qeyûmê ke bi destê Erdoganî ameyî tayînkerdene roje bi roje peynîya muşterekanê şaredarîyan anê. Ê ravurîyayîşê wayîrîye anê ca. Neberdbaranê şaredarîyan roşenê terefgiranê xo... ***R.9***

## Ji xwezaya kurdan jî ditirsin

Hevberdevkê Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê Mirad Bîlgîç, diyar kir ku divê li dijî talana xwezayê refleksên civakî bên avakirin û wiha got: "Dewleta tirk ji 2012'an ve wekî polîtîkayekê li hemû cihên ku daran jêdike qereqol û qeleqolan ava dike. Bi hinceta pirsgirêka ewlehiyê van daran jêdikin. Dibêjin em herêmê diparêzin lê tişteki wisa nîne. Lewre gelê kurd parastineke wiha ji kesekî wan nexwestiye. Bi çêkirina bendavan û bi jêkirina daran dixwazin tirsa leşkeran bixe di nava gel de. Navê wê dikin herêma ewlehiyê lê ji kurdan paqij dikin."... ***R.3***

## Destarê Kurd-î dê her bigere

Kovara Destar a wejeyî ya ku ji sê mehan carekê, bi çar zaraveyên kurdî tê weşandin bi hejmara xwe ya 5'emîn gihişt ber destê xwendevanên xwe yên kurdîhez û wêjehez. Kovara Destar a ku bi dirûşma 'Destarê Kurd-î Hûr Dihêre' dest bi weşanê kiribû, salek li pêy xwe hişt û bi hejmara xwe ya 5'an careke din bi konsept û naveroka xwe ya dewlemend û bi destargerên xwe yên kedkar û şoreşgerên wêje û zimanê kurdî, derket pêşberî xwendevanên xwe. Di vê hejmarê de jî bi dehan destargerên kurd-î yên ji her çar milên Kurdistanê û ji gelek welatên cuda yên cîhanê bi nivîsên xwe yên têr û tijî di Destarê de cih digirin... ***R.11***

## Ji bo darvekirinê tu kurd bî bes e!

Mêvanê hevpeyvîna me ya vê hefteyê Zana Ûrmiye ye. Zana li ser rewşa girtîgehên Îran û rojhilatê Kurdistanê rawestiya û diyar kir ku li Îranê ji bo darvekirinê tenê kurdbûna wan bes e û wiha axivî: "Armanca darvekirinan kontrolkirina civakê ye, ne ku çareserkirina pirsgirêkên di nav civakê de ne. Ji ber ku li Îranê tu saziyên mafên mirovan nikarin rasterast daneyan kom bikin em ji sedî sed nikarin bibêjin ku ev qas kes girtî ne. Li ser girtiyên siyasî yên li Îranê her çi qas daneyeke rasteqîn tunebe jî li gor texmînan derdora 4-5 hezarî girtî hene."... ***Hevpeyvîna Medya Bal / R.4***

rupel 12++_Layout 1 12.08.2022 15:32 Page 1

xwebûn

15 - 21 Tebax 2022 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 139

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:**
Kadri Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:**
Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:**
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Fırat Mahallesi 499/1. SK
100 Evler Sitesi No: 6F
**Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Kurdanê Kafkasya ra yew pelge: Şemsedînovî





Dr. Îsmet Konak

Tarîxê kurdan de warê Kafkasya xeylê balkêş o. Tayê eşîrê kurdan binê serdestîya rûsan de ciwîyaybî. Tayênan vera rûsan şer kerdbî. Nê eşîran ra nameyê redkanî zaf vîlabîyaye yo. Çimeyanê rûskîyan de ma zaf raştê nameyê înan yenê.

Tarîxê eşîra redkan xeylê kan o. Înan ser o cigêrayox Rohat Alakom û Nîhat Onerî xeylê xebatî kerdî. Derheqê kokê etîmolojîkî yê nameyê eşîra redkan de Nîhat Onerî meqaleyêka bi nameyê "Kurdanê Kafkasya ra Eşîra Redkan" nuşte. Na meqale hûmara neweye ya Kovara Cigêrayîşanê Kurdî de do çap biba.

Goreyê nuşteyê Onerî nameyo tew kano yê eşîre "zîlla" yo. Bado tayê çimeyan de sey zîlan ameyo şuxilnayene. Oncîna tayê çimeyan de nameyê redkî yan redkan zî yeno dîyene. Derheqê pênaskerdişê redkanî ser o çend çîrokê fekkî estê. Wextê Mervanîyan (983-1085) de redkanijî dormeyê Farqînî de ciwîyayêne. Rojêke înan ra ju kêneke rayîr de rastê lajê mîrê Mervanîyan ameye. Tîya de bi kolî da lajekî ro û uca de kişt. Nê semedî ra leşkerê mîrî axmeyê Farqînî bîyî. Dewa Kelê de mabênê leşkeran û mordemanê eşîra zîlla de pêkewtişî qewimîyayî. Peynîye de pêro leşkerê mîrê Mervanîyan ameyî kiştene û şarê herême înan rê kirdaşkî vat "gişt red kirin", bi kirmanckî "pêro qir kerdî". Nê serebûtî ra tepîya nameyê eşîre sey "redkî yan redkan" ame zanayene.

Seserrî derbaz bîyî û baskê eşîre xeylê vila bîyî. Tayê baskê eşîre heta herêma Serhedî, Kafkasya û herra Rûsya şîyî. Na cografya de şemsedînovî mîyanê keyeyanê eşîre de xeylê balkêş ê. Meqaleya ma de derheqê têkilîya şemsedînovan û Rûsya bikerîme. Kokê nameyê keyeyê şemsedînovan şino seserra XVIII. Konteksê na babete de xeylê xebatê cigêrayox û tarîxnas Rohat Alakomî estê. Alakom nuşeno ke kokê şemşedînovan, nameyê Şemdîn Axayê Berzî ra yeno. Şemdîn Axayo ke lajê Sileman Axayî bî seserra XVIII. de ciwîyaybî. Lajê Şemdîn Axayî zî tarîxê eşîra redkan de cayê girîngî gênê. Cigêrayox Alakom nameyê înan wina dano: "Alî Bey, Xelîl Bey, Hesen Axa, Huseyîn Axa, Muhammed Axa, Osman Axa, Sadun Axa."

Nê nameyan ra ver rey Alî Bey ro qayît bikerîme. Alî Beyî ra zêde nameyê lajê ey Cafer Axayî zaf balkêş û naskerde yo. Tarîxnaso kurdo ke Rûsya de xebatanê xo yê akademîkî rayra beno Nodar Mosakî bi Dîmîtrîy Pîrbarîyî derheqê cuya Cafer Axayî de meqaleyêke nuştbî. Goreyê na meqale Cafer Axa serra 1806î de Xanîya Revanî de ame dinya. Nameyê xo yo bîn "Gulî Cewer Axa" bî. O ofîsero kurdo yewino ke artêşa Rûsya de wezîfe kerdbî. Serra 1853î de sey mulazimî mîyanê artêşa Çarîya Rûsya de ca girewt. Qaso ke ma zanê no wext mabênê Rûsya û Împaratorîya Osmanî de lejê Kirimî qewimîya. Wextê nê lejî de Cafer Axa û derazayê xo Ahmet Axa vera artêşa Osmanî têgêraybî. Kurdanê Rûsya ra di alayî ameyî viraştene. Alaya yewine tewrê mufrezeyê Erîvanî, alaya diyine tewrê mufrezeyê Aleksandropolî (Gumru) bîbî. Goreyê Mosakî û Pîrbarî fermandarê alaya yewine Cafer Axa bî, fermandarê alaya diyine Ahmet Axa bî. Tayê cigêrayoxî na çarçewa de melumatê cîyayî danê. Tarîxnas Celîlê Celîl dîyar keno ke mîyanê mufrezeyê Aleksandropolî de liqo ke 100 êzidîyan ra amebî viraştene estbî. Axmet Axayî teyna no liq îdare kerdêne. Yewîyê kurdî binê îdareyê mîralayê rûsî M.T. Lorîs-Melîkovî de bîyî.



Wextê lejê Kirimî de bitaybetî Cafer Axayî seba artêşa Rûsya hetkarîya girse kerdbî. Serra 1854î de fermandarê mufrezeyê Erîvanî K.K. von Vrangelî seba îşxalkerdişê Bazîdî çend planî kerdî. Ey waşt ke bi eşîranê Bazîdî yê sey Heyderan û Celalî de têkilîyan bivirazo. Sayeyê mabênkarîya Cafer Axayî serekanê eşîranê Bazîdî bi artêşa rûse peymane kerde.

Peynîya hetkarîya eşîranê kurdan de Bazîd bi destê artêşa Rûsya amebî girewtene. Bazîdî ra dima artêşa Rûsya ya ke binê fermandarîya N.N. Muravyovî de bîye, hêrişê Qersî kerdbî. Tîya de oncîna Cafer Axayî hetkarîya xo daye Rûsyaya Çarîye û Qers amebî îşxalkerdene.

Lejê Kirimî ra dima mîyanê artêşa rûse de xizmetê Cafer Axayî dewam kerd. O heta generalîye berz bî. Homa ke lejê 93î yanî 1877-1878î dest pê nêkerdbî, Cafer Axa 11ê adara 1877î de şî heqîya xo. O dem artêşa rûse seba amadebîyayîşê lejî kurdan ra hetkarîye waştbî. Lajê Cafer Axayî Alî Eşref Beyî cayê pîyê xo girewtbî. Labelê mîyanê kurdan de tesîrê Alî Eşref Beyî goreyê pîyê xo xeylê senik bî. O teyna kurdanê Rûsya ser o tesîrdar bî. Nê semedî ra Rûsya mîyanê kurdanê ke sînor de ciwîyayêne de hêz vîndîkerdbî.

Wextê lejê 93î de ganî ma qala lajêkê bînî yê Cafer Axayî bikerîme. Nameyê ey Eyup Paşa bî. Mîyanê şemsedînovan de karakter û hoka vînayîşî ya Eyup Paşayî cîya bîyî. Ey de dewleta Osmanî rê sempatî estbî û lejê 93î ra çend aşmî verî wezaretê teberî yê dewleta Osmanî rê waştişnameyêk nuştbî. Ey pê cerga xo ya ke 600 keyeyî ra ameyêne viraştene bext waşt. Tebîî îdareyê tirkan nê waştişnameyêkî rê cewabo bîyaye da. 18ê teşrîna verêna 1877î de Eyup Paşa û 600 keyeyê ci sancaxê Bazîdî de ameyî cakerdene. Yeno fikrîyayene ke cerga Eyup Paşayî bado şîye wîlayetê Wanî. Oncîna dîya zanayene ke dewleta Osmanî 1500 quriş meaş dabî ci.

Derheqê tarîxê şemsedînovan de ganî ma qala Huseyîn Axayî bikerîme. Nameyê xo yo bîn "Huseyîn Axayê Çokdeve" (tayê çimeyan de sey "Çongdeve" yeno nuştene) bî. Huseyîn Axa baxusus Xanîya Revanî de zaf merdimo namdar bî. Kurdê Revanî esasî binê bandora Huseyîn Axayî de ciwîyaybî. Cigêrayoxo rûs A.Î. Averyanov vano ke nîmê yewinê seserra XIX. de Xanîya Revanî de 8.000 keyeyê kurdî estbî. Labelê na hûmare binîqaş a. Derheqê nufusê Xanîya Revanî de cigêrayîşê cîyayî zî estê. Înan ra ju, xebata cigêrayox û tarîxnas Îvan Şopenî ya. Şopenî a herême de awanîya demografîke ser o xeylê cigêrayîşê erjayeyî kerdbî. Şopen pare keno ke serra 1828î de Xanîya Revanî de 2.964 keyeyê kurdî estbî.



No dem Xanîya Revanî herra Îranî bîye. Rûsyaya Çarîye waştêne nê herran bigêra binê serdestîya xo. Seba nê armancê xo waşt bi kurdanê Revanî têkilîyan biviraza. Goreyê melumatîyo ke bi destê Averyanovî yeno dayene, fermandaro rûs P.D. Tsîtsîanovî pê Huseyîn Axayî têkilîye viraşte. La Huseyîn Axayî dekewtişê binê serdestîya Rûsya red kerdbî. Çike kurdî hem îqtîdarê Rûsya ra tersayêne hem zî serkewtişê Rûsya ra zêde bawer nêkerdêne. Artêşa Rûsya tayê pêkewtişan de binkewtbî. Na rewşe tesîrê bira kurdanê Revanî bîbî.

Serranê 1828-1829an de mabênê Rûsya, dewleta Osmanî û Îranî de şer qewimîya. Peynîya şerî de peymanî ameyî îmzekerdene. Rûsya bi Îranî ya peymana Turkmençayî îmze kerde. Goreyê na peymane Xanîya Revanî Rûsya rê mende. Bi nê hawayî kurdê Revanî û tebîî Huseyîn Axa kewtî binê patronajê Rûsya. Seba kurdan rîpela neweye abîyaye.

Cigêrayox Nîhat Oner nuşeno ke badê ke Rûsya Revan girewt xo dest, awanîya demografîke ya Revanî avurne. Cayanê ke kurdî ciwîyayêne de armenîyî û xirîstîyanî ameyî cakerdene. Nê semedî ra Huseyîn Axayî nêrazîbîyayîşê xo mojna. Serra 1828î de muhafizê tirkî yê Qersî Osman Paşayî rê mektubêk şawit, seba xo û eşîra xo derûdormeyê Qersî de ca waşt. Cewabo bîyaye girewt û bi tayê keyeyan şî Qers. Na game ra tepîya eşîra redkan bîye di lete. Leteyê xo dewleta Osmanî de bî û o bîn Rûsya de bî.

Huseyîn Axayî basko ke hetê tirkan de bî îdare kerdêne, birazayê xo Cafer Axayî baskê Rûsya îdare kerdêne.

Ê Huseyîn Axayî yew zî di lajêkê xo yê namdarî estbî. Nameyê înan Kasim Axa û Kucuk Şemdîn Axa bî. Serra 1842î de Huseyîn Axa dewa bi nameyê Kêrs de şî heqîya xo. Na dewe nika girêdayîyê Qaxizmanî ya. Labelê axa na dewe de nêame definkerdene. O dewa Pifika Şêxa de defin bî. Mezela axayî serra 1960î de rîyê heyelanî ra zîyan dîbî. Sî û nuşteyê mezele hema warê goristanî de axmebîyaye yê.

Sey peynîye tarîxê keyeyê Şemsedînovan xeylê girîng o. Ê Kafkasya de wayîrê zaf cayê rûmetin ê. Tarîxê nê keyeyî neynika têkilîyanê rûsan û kurdan o.